Ji çalakiyên Nîsanê

Li 17. 4 . 2008an , roja Pêncşemê , derdora nîvro , giropek ji rêvebirên Danezana Şamê (Îlan Dîmeşq) di nav de şandek ji Partiya Yekîtî ya Demoqrata Kurd li Sûriyê bi boneya cejna Celaê , seredana gora welatperwerê xebatkar ê mezin ê Kurd Ibrahîm Henano kir . Di wê seredanê de , baxek gul û kulîlk bi navê Danezanê dînan ser gora wî nemirî , û hin gotin hatin pêşkêşkirin.

Seyrana xwendekarên zanîngeha Helebê

Careke din bi hatina heyva Nîsanê , geşbûna Buharê û xemlandina zemîn û asîmanê bi çîçek , gul , ro û perwanê ; rêxistina xwendekarên Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd Li Sûriyê seyrana navendî ya zanîngeha Helebê li darxist . Di 11/4/2008 an de xort û keçên Kurd berê xwe dan gundê Celemê û li ber gola gund , li rex kaniya wê seyranek bedew û binefş derbaskirin . Dora 6000 kes li seyranê beşdar bû , û tev dîlanên Kurdî , reqs û semayên xweşik , çepik û lîliyên bilind , awazên evînî û netewî bi dengên hunermendên gewre mîna : Zekeriye dilcan , Osmancan , Canboro , Cîhan û Newroz û tev semayên komên Zanîn û Cûmê seyrana Buharê xemilî û bi awakî qenc û aştiyane li darket . Hêjayî gotinê ye ku, destlata Sûriyê xwest vê seyranê kulek bike bi beşdarbûna hejmarekî mezin ji şaxên parastinî . Lê, mixabin viyana hevalan ji çiyayên nerindiya wan
bilintir bû û seyran mîna newrozekê hate şênkirin . Sipasîk mezin ji bo hevalên **P.Y.D.K.s** , û sipasîk taybetî ji xelkê me yê gundê Celemê û Cindirêsê re em bi rêdikin .

Ji weşanên nû

Pirtûka

Efrîn Ebre Elisor

Ev pirtûka ji afrandina mamoste Merwan Berkat e . Bi zimanê erebî û şêwakî hêsan hatiye rêstin . Derhênan û çapa wê baş e . Ji (462) rûpelan , qetê orte pêkhatiye . Ew dabeşî ser (8) deriyan bûye . 1- Cîgeha Ciyografî (navlêkirin) . 2- Xwendinek ciyolocî ji herêma Efrînê re (Çiyayê Kurmênc) . 3-Efrîn ji sedhezarsal ve , herêma hêminî ya ademîzadiyê ye . 4- Çiyayê Kurmênc (Efrîn ebre elisor eltarîxiyê) . 5- Êzdî li Çiyayê Kurmênc – Dîroka wê . 6- Hin cîgehên bermayî li herêma Efrînê . 7- Çandinî . 8- Herêma Çiyayê Kurmênc , herêma gerkêşan û seyrankêşanê ye .

Çend pelên dawiyê jî yên navnîşanên sereke û şaxeyî yên pirtûkê , û jêderên bi kêrî wê hatine re ne . Û di rûpela dawiyê de jî , berhemên erebî yê xwediyê vê pirtûkê hatine xuyakirin . Di dawiya rûpela dawiyê de gotinek nirxbuha ji gotinên ramangîr Îmad Elesfehanî cî girtiye.

Em bi navê desteya birêvebirina weşana Newrozê , sipasiya mamoste Merwan Berekat dikin , hêviya berdewamî û pêşketinê jê re dixwazin ,û gurzek gulên rengîn û bînxweş jê re diyarî dikin.